Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :435 nameronahi@gmail.com 16- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Minbic, herdem bajarekî stratejîk bû -2-



Ehmed ÇÎMEN

### DI OPERASYONÊ DE MERHELEYA YEKEM

Operasyona Minbicê ji du merhaleyan pêk dihat. Gava yekem rizgarkirina gund û bajarokên derdora bajar bû. Mehek di ser operasyonê re derbas bibû û êdî Minbic ji her çar aliyan ve hatibû dorpêçkirin. Çeteyan jibo şikandina dorpêçê ji başur, rojava û bakur ve 3 caran êrîşên berfireh kirin. Her sê êrîş jî li diwarê parastinê ya şervanên Meclisa Leşkerî qelibî û şikestin. Di gava yekemin de şervanan 20 êrîşên bi maşîneyên bombebarkirî vala derxistin, 4 depoyên çekan û 3 kargehên çêkirina mayinan bidestxistin. Di nava mehekê de ji pira Qereqozax heta nêzî sînorê El-Bab qadeke hezar û 200 kîlometreçargoşe hat rizgarkirin.

Dorpêça li derdoran çeteyên DAIŞ her dibû teng dibû. Çeteyan ji alî leşkerî ve têkdiçûn û morale wan xera bibû. Gelê sivil dîl girtibûn.

Rêxistinên civaka sivil û aktîvîstan bang dikirin ku can û malê sivilên li bajar were parastin. Li ser vê bangê Meclisa Leşkerî ya Minbic jibo parastina sivilan daxuyaniyek da.

Di daxuyaniyê de Meclîsa Leşkerî 48 seet muhlet dida çeteyan ku, karibin bi çekên xwe yên sivik xwe ji bajar xelas bikin.

### 170 HEZAR SIVÎL HATIN RIZGARKIRIN

jiber ku çeteyan gele sivil dîl girtibûn şervanan pêşdeçûna xwe bi awayekî kontrolkirî giran kiribûn. Lê Meclîsa Leşkerî ya Minbic yekîneyên taybet ava kir û bi hişyariyek mezin jibo rizgarkirina sivîlan operasyonên nokteyan lidar xist û çend korîdor ji wan re vekir. Yekineyên pispor a di bin kordîneya 15 şervanan de mayinên li ser deverên ku sivîl tê re werin rizgarkirin paqij kirin, sekvanên DAIŞ bêbandor kirin. Piştre bi hezaran sivîl ji van korîdoran derbasî deverên bi ewle kirin. Ji destpêka operasyonê heta dawî zêdetirî 170 hezar sivil hatin rizgarkirin. Pêdiviyên jiyanî yên sivilên ku bi taybet li bajaroka Ebû Qelqel û derdora gundê Hey El-kebîr hatibûn bicihkirin dîsa şervanan û Meclîsa Sivil a Minbicê bi hev re pêşwazî dikirin.

### JINAN ÇARŞEFÊN REŞ AVÊTIN

Gav bi gav Minbic a xwedavenda Bakurê Surî Atargatis rizgar dibû.

Li ser axa Atargatis, jinan êdî ber bi azadiya xwe ve gav davêtin. Destpêkê çarşefên reş ji ser xwe davêtin û dişewitandin. Erda Minbic bi çarşefên reş tije bibû. Jinan bi vê helwesta xwe tola xwedavend Atargatîs ji zihniyet û zulma DAIŞ radikirin.

Bandora şoreşa jina Rojava, êdî gihiştibû bakurê Surî.

### PIŞTÎ 73 ROJAN MIZGINÎ

Çeteyên DAIŞ tenê di taxa El Sirib a li ser riya Cerablusê de mabûn û nêzîkî 3 hezar sivîl dîl girtibûn. Jiber ewlekariya sivilan 3 roj bûn şervan li taxê mal bi mal pêşde diçûn.

Di roja 73'yan a operasyona rizgarkirina Minbicê de mizgîniya ku herkes li bendê bû, hat: Taxa El Sirib jî bi temamî hatibû paqijkirin.

Bajarê fermandarê nemir Ebû Leyla, piştî şerê 73 rojan, 12'ê Tebaxa 2016'an, di seet 17:05'an de bi temamî ji çeteyan hat paqijkirin.

Bajarê xwedavend Atargatîs û fermandar Ebû Leyla êdî azad bû...

### LI KOLANAN PÎROZBAHÎ

Şervanên Meclîsa Leşkerî ya Minbic û gel, li kolanên bajar dest bi şahî û pîrozbahiyan kirin. Ebû Leyla ew roj nedît, lê posterên wî yê dev li ken li hemû qadên bajarê Minbicê bilind dibû. Şervanên wî soza xwe pê anîbûn.

Şervan û fermandarên Minbicê hêsirê çavan dibarandin û digotin, "bila ruhê Ebû Leyla şad be" û serkeftina mezin li hemû gelên Surî pîroz dikirin.

Piştî bihîstina mizginiyê, li kantonên Kobanê, Cizîr û Efrînê, li taxa Şêx Meqsud a Helebê gel daket kolanan û mijgîniya xêrê bi şahiyan pîroz kirin.



15'ê Tebaxê: Bilançoya operasyona Minbicê eşkere bû

Piştî ku bajar bi temamî ji çeteyan hat paqijkirin, şervanan dest bi paqijkirina mayinên li herêmê kirin. Di nava demek kin de zêdetirî 12 hezar mayin hatin rakirin.

Roja 15'ê Tebaxa 2016'an Fermandariya Giştî ya Meclîsa Leşkerî ya Minbic, encamên Operasyona fermandar Faysal Ebu Leyla bi daxuyaniyeke çapemeniyê ji raya giştî re eşkere kir.

Di operasyonê de nêzîkî 300 gund û bajarok hatibû rizgarkirin.

4 hezar û 180 çete hatibûn kuştin. 112 çete bi saxî dîl hatibû girtin.

### 264 ŞERVAN ŞEHÎD BÛN

Operasyona Minbicê bi berdêlên giran gihiştibû serkeftinê. Di daxuyaniya fermandariyê de hat gotin ku di tevahiya operasyonê de 264 şervanên Kurd, Ereb û enternasyonal şehîd ketine. Di nava wan de Fermandarê nemir Ebû Leyla, şervanê Êzîdî Hure Hisên Elo (Brusk Karker), şervanên enternasyonal Eylem Ataş (Cemre Heval), Dean Carl Evans (Givara Rojava), Martin Gruden (Rodi Çekdar) û gelek şervanên din ên biyanî jî hebûn.

Di heman rojê de Meclîsa Leşkerî ya Minbic tevî malbata Ebû Leyla, sipasiya hemû hêzên beşdarî operasyonê bibûn kir û got "êdî em bajar ji îro pêve teslîmî Meclisa Sivil a Minbic'ê dikin".

Piştî ku çeperên parastinê hatin xurtkirin roja 23 Tebax a 2016'an yekîneyên YPG/YPJ'ê ji Minbic'ê vekişiyan.

Êdî Meclisa Sivil û gelê Minbicê bi hev re dest bi avakirina jiyana nû kirin.

### LI MINBICÊ SERDEMA DEMOKRATAN

Piştî rizgarkirinê li Minbicê pergala hatiye avakirin, pir rengî ye. Lewma welatî mîna ku ji dojehê derbasî bihûştê bûne, vê pêvajoyê wekî "serdema demokratan" binav dikin.

Di serdema nû de sûdek mezin ji tecrubeyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Rojava hatiye girtin û bajar li gorî taybetmendî û xweseriya xwe dihat birêvebirin.

Pergal li ser esasê temsîliyeta gel, rêxistinkirin û perwerdekirina wê hatibû avakirin. Meclîsa Sivîl a Giştî, meclîsên gel ên gund û taxan, akademiyên perwerdeyê, Rêxistina Ciwanan, Rêxistina Jinan, Mala Jin, Şaredarî, Saziyên Xizmetguzariyê, Dadgeha Gel hîmên esasî yên vê pergalê bûn.

Sîwaneya herî bilind a rêvebirina bajar Meclîsa Rêveber a Minbicê bû.

Di 5'ê Nîsana 2016'an de bi tevlîbûna 43 kesan hatibû avakirin û tevî derfetên kêm xebatên rêxistinkirina bajêr dida meşandin.

Di 17'ê Adar a 2017'an de Meclîs hate nûkirin. 13 komîteyên rêveberiyê hatin diyarkirin û hevserokên komîteyan hatin hilbijartin. Meclisa Zagonsaz ev kes erê kirin. Piştî sund xwarina bi zimanên Kurdî, Erebî, Tirkmanî û Çerkezî rêveberiya nu dest bi kare xwe kir.

Di dema DAIŞ de jinên ku jiyan li wan bibû dojeh, jinûve renge xwe dan jiyanê û civakê. Îro sîstema hevserokatiyê di hemû saziyan de rûniştiye. Meclîsa giştî ji 120 meclîsên gund û 5 meclîsên taxên bajar pêkhatiye û tevna civaka Minbicê birêxistin kiriye. Êlên herêmê di meclîsê de tên temsîlkirin û ji wana 64 êlên ereb in. Biryar bi beşdarbûna hemû pêkhateyên meclîsê tên girtin û pêkanîn. Lewma di demek kurt de veguheriye sîwaneya rêvebirina hemû bajarê Minbic û gundewarên wê.

### MINBIC BÛ MODELA SÛRIYA DEMOKRATÎK

Li bajar û gundan 400 dibistan hebûn û tev di dema DAIŞ'ê de yan hatibûn girtin yan jî bibûn baregehên lekşkerî yên çeteyan. Rêveberiya nû di demek kin de 250 dibistan sererast kirin û xwendevan ji nûve dest bi perwerdeyê kirin.

Jibo jinan, ciwanan, hêzên leşkerî û asayîşê akademî hatin vekirin.

Di warê parastina bajar de gavên mezin hatin avêtin û din ava salekê de zêdetirî 4 hezar kes tevlî meclisa Leşkerî û hêzên Asayişê bûn. Tevlibûna jinan a nava hêzên ewlekariyê bal kişand.

Piştî rojên reş suka bajar careke din zindî bû. Gel bi rehetî dikare di her seetekê de bigere û biçe her bajarekî.

Her netewek û her baweriyek êdî li Minbicê dikare bi renge xwe, bi çand û baweriya xwe bijî û temsîla xwe din ava rêveberiya bajar de bibine.

Bi vî awayî Minbic ji bo hemu bajarên din ên Suri re bû mînak

Bajarê k udi nava ewlekariyê de dijî herwiha jibo koçberan jî bû stargehek bingehîn. Zêdetirî sed hezar koçber ji Heleb, Bab, Meskene, Reqa, Cerablus û Ezazê ji bin zulma çeteyan û rejima Baas reviyan û li derdora Minbic û nava bajar de bicih bûn. Jibo koçberan 2 konbajar hatin avakirin û rêveberiya Minbicê jibo jiyana koçberan alikariya xwe kêm nekir.

FİNAL

Minbic hevsengiyên herêmî û navnetewî guherand Rojava, beşa herî biçûk a Kurdistanê bû. Lê pêşketinên liv ir dihatin jiyîn pir mezin bûn. Her pêşketina li vî parçeya biçûk a Kurdistanê bandoreke mezin li demokratîkbûna Suriye û Rojhilata Navîn kir.

Piştî rizgarkirina Minbicê bajarê Tebqa ya ku jibo DAIŞ pir girîng bû hat rizgarkirin û nêvî zêdetir ê bajarê Reqa ya ku weke paytexta Xîlafeta DAIŞ tê nasîn jî ketiye deste şervanên QSD'ê.

Serkeftinên leşkerî di warê siyasî de rê li ber federasyona bakurê Surî vekir û di qada civakî de gelan bi jiyana azad a hevbeş hîn xurtir gihand hev û jibo çareserî û siberoja demokratîk a Surî hêvî mezin kir.

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 435 16- Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Li Efrînê 10 dagirker hatin kuştin



Şervanên YPG'ê li Efrînê bi çalakiyên bi bandor derbên giran li dagirkeran didin. Navenda Ragihandinê ya YPG'ê li ser çalakiyên 12'ê Tebaxê yên li navenda Efrînê daxuyaniyeke nivîskî weşand. Li gorî daxuyaniyê, li dijî koma çete ya bi navê Firqet Hemze 2 çalakiyên sabotajê hatin kirin û di çalakiyê de 10 çete hatine kuştin. *R-2*

# OCALAN XWÎŞK Û BIRATIYA GELAN AVA KIR

Dewleta Tirk tecrîdeke giran daniye li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û rê nade ku malbat û parêzerên wî herin Îmraliyê. Ti pêwendiyeke Ocalan bi derve re tune ye û ti agahî jê nayên girtin. Rewşa Ocalan di nava gelê Kurd de rê li ber fikaran û nerazîbûnan vedike. Ji ber vê jî çalakî û bertekên ji bo rewşa Ocalan berdewam dikin.



Welatiyên bajarê Qamişlo tecrîda li ser Ocalan şermezar kirin û diyar kirin ku li Bakurê Sûriyê gelan li ser bingeha fikrên Ocalan DAIŞ têk birin û xwîşk û biratiya xwe ava kirin. Nivîskar û rojnamevanên başûrê Kudistanê jî nerazîbûn nîşanî tecrîdê dan û diyar kirin ku ji bo azadiya Ocalan divê gel hê zêde xwedî derkeve û çalakî mezin bibin. *R-2*

## Oldaran hovîtiya dewleta Tirk li dijî şehîdgehan şermezar kirin



Nerazîbûnên li dijî hovîtiya dewleta Tirk ya li hember goristana şehîdan a Efrînê zêde dibin. Yekitiya Oldarên Dêrikê û Meclisa Rûspî û Eşîran a herêma Cizîrê êrîşên leşker û komên çete yên dewleta Tirk a dagirker yên li dijî goristana şehîdan a Efrînê bi tundî şermezar kirin. Oldaran diyar kir ku ev hovîtiya li dijî gorên şehîdan li dijî pîvanên olî ne. *R-6*

## Ciwanên Êzîdî tevli çalakiya mertalên zindî bûn



Endamên Yekîtiya Ciwanên Êzîdî tevlî çalakiya mertalên zindî ya li Qendîlê bûn û diyar kirin ku ew ê careke din rê nedin komkujî li ser gelê Êzîdî pêk were. Ciwanan diyar kir ku hişmendiya şer û komkuj dixwaze komkujiyên mîna Koço û Til Hezir bike û gotin, "Em ê jî destûra vê nedin. Ji bo vê em li vir in." *R-2*

## Komeleya Çerkez hate vekirin




Di salvegera duyemîn ya rizgarkirina Minbicê de, xebatên xwe birêxistinkirinê yên pêkhateyên bajar jî berdewam dikin. Di minasebeta salvegera rizgarkirina Minbicê pêkhateya Çerkez bi armanca parastin çanda Çerkez û rêxistinkirinê Komeleyeke bi navê "Komeleya Çerkez" vekir. Di merasîma vekirina komeleyê de welatiyên Çerkez û endamên rêveberiya Minbicê amade bûn. *R-2*

## Ez ji Kurdan fêrî azadiyê bûm

Jina ji Misrê ya bi navê Nihmet Tewfîq ku ji destên çeteyên DAIŞ'ê hat rizgar kirin diyar kir di nav DAIŞ'ê de wan jiyaneke gelek bi zilm û zehmet derbas kir. Jina Misrî wiha got, "Min dixwest tenê ez ji DAÎŞ'ê xelas bibim. Bi rizgarkirina bajarê tebqayê re şervanên QSD'ê em xelas kirin. Ez ji Kurdan fêrî wateya azadiyê û jiyana bi rûmet bûm. *R-3*



## Gel û koçber li dijî çeteyan rabûn



Kiryarên hovane yên leşker û çeteyên Tirk yên dagirker li Efrînê bê navber dewam dikin û roj bi roj zêdetir dibin. Welatiyên Xuta El Şerqiye ku Artêşa Tirk li Efrînê bi cih kirine li dijî çeteyan rabûn. Her wiha çeteyan hêjmarek ciwanên taxa Mehmûdiyê jî revandin û nayê zanîn bi kude birine. *R-5*

## Divê statuya Êzidiyan were naskirin



Navenda Yekîtiya Komalên Êzîdiyan (NAV-YÊK) komkujiya 14'ê Tebaxa 2007'an a li Şenbalê, li bajarokê Til Hizêr û Komelgeha Sîba Şêx Xidir bi bî anî. NAV- YEK'ê êrîş şermezar kir û diyar kir ku ev êrîş destpêka fermana mezin ya 3'ê Tebaxê bû. NAV-YEK'ê xwest statuya Êzidiyan were naskirin. *R-5*

## Gerîla li Barzan, Colemêrg û Sêrtê lê

Gêrîlayên HPG'ê li başûr û bakurê Kurdistanê bi çalakiyan derbên giran li artêşa Tirk didin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir gêrîla li herêma Barzanê ya Başûrê Kurdistanê, li Colemêrg û Sêrtê yên li bakurê Kurdistanê li dijî hêzên Tirk ên dagirker çalakî pêk anîn. Herî kêm 6 leşker hatin kuştin. *R-2*

## Minbic bi kedeke mezin hat rizgarkirin



Hevserokê Meclisa Zagonsaz a Rêveberiya Sivîl a Minbicê Farûq El-Maşî bi minasebeta salvegera duyemîn a rizgarkirina Minbicê ji DAIŞ'ê axivî û diyar kir ku Minbic bi saya ked û xwîna şehîdan hat rizgarkirin. El Maşî da zanîn ku Minbic niha bajarê herî bi ewle ye û bang li gelê Sûriyê kir ku tevlî avakirina Sûriya nû bibin." *R-4*

## Bi ruhê 15'ê Tebaxê berxwedan dewam dike



Konseya Rêveber a KNK'ê bi wesîleya salvegera Pêngava 15'ê Tebaxê daxuyaniyek weşand û Pêngava 15'ê Tebaxê pîroz kir. KNK'ê diyar kir ku di salvegera 34'an a Pêngava 15'ê Tebaxê de dewleta Tirk êrîşkariya xwe bi hemû rê û rêbazan didomîne û got, "Divê gelê Kurdistanê bi ruhê 15'ê Tebaxê hêza xwe bike û têkoşîna azadiyê bi ser bixîne." *R-4*

## Polîtîkaya Erdogan dibe sedema krîzan



Parlamenterê HDP'ê yê berê Faysal Sariyildiz, krîza aborî ya li Tirkiyê tê jiyîn nirxand û got: "Ev krîz bi şerê Erdogan ê li dijî gelê Kurd da destpêkirin re derket holê. Êdî polîtîkayên Erdogan têk çûne û ev polîtîka dibin sedemên krîzan. Lê hê jî dixwazin fatureya krîzê bi derve ve girê bidin." *R-5*

## Sedema qrizê AKP ye

*Tayîp TEMEL* *R-4*

# Li Efrînê 10 dagirker hatin kuştin


***Şervanên YPG'ê li Efrînê bi çalakiyên bi bandor derbên giran li dagirkeran didin. Navenda Ragihandinê ya YPG'ê li ser çalakiyên 12'ê Tebaxê yên li navenda Efrînê daxuyaniyeke nivîskî weşand. Li gorî daxuyaniyê, li dijî koma çete ya bi navê Firqet Hemze 2 çalakiyên sabotajê hatin kirin û di çalakiyê de 10 çete hatine kuştin.***



Li navenda Efrînê di çalakiyên şervanên YPG'ê de 10 çeteyên dewleta Tirk a dagirker hatin kuştin.
Navenda Ragihandinê ya YPG'ê li ser çalakiyên 12'ê Tebaxê yên li navenda Efrînê daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Li gorî daxuyaniyê, 12'ê Tebaxê li dijî koma çete ya bi navê Firqet Hemze li taxa Tirindê ya navenda Efrînê 2 çalakiyên sabotajê hatin kirin.
Navendê diyar kir ku di çalakiyê de 10 çete hatine kuştin, herî kêm 20 çete birîndar bûne.

## Gerîla li Barzan, Colemêrg û Sêrtê lê da

Gerîlayên HPG-YJA Starê li herêma Barzanê ya Başûrê Kurdistanê, li Colemêrg û Sêrtê yên li bakurê Kurdistanê li dijî hêzên Tirk ên dagirker çalakî pêk anîn. Herî kêm 6 leşker hatin kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla daxuyaniyeke nivîskî weşand û ev agahî da:
"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de li dijî artêşa TC a dagirker çalakî li dar xistin. Agahiyên berfireh ên li ser çalakiyan;
13'ê Tebaxê saet 18:20'î li herêma Barzanê ya li Başûrê Kurdistanê li dijî artêşa TC a dagirker ku li qada Tepê Xwedê bû, çalakiyek hate lidarxistin. Derbên giran li çeper û stargehên li ser gir hatin xistin û di çalakiyê de leşkerekî dijmin hate kuştin.



Hêzên me yên YJA Starê li dijî leşkerên li ser girê Elîşêr ê li navçeya Geverê ya Colemêrgê çalakiyeke sekvaniyê kirin. Di encamê de leşkerekî dijmin hate kuştin.
Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de 14'ê Tebaxê saet 14'an li artêşa Tirk a li ser girê Şehîd Canxurt ê li herêma Herekolê ya Sêrtê xistin. Ji du baskan ve derbên giran li hêzên dijmin hatin xistin û 4 leşkerên dijmin hatin kuştin."

## Ciwanên Êzîdî tevli çalakiya mertalên zindî bûn



Endamên Yekîtiya Ciwanên Êzîdî tevlî çalakiya mertalên zindî ya li Qendîlê bûn û gotin ew ê rê nedin komkujî û dagirkeriyê.
Endamên Yekîtiya Ciwanên Êzîdî tevlî çalakiya ku li dijî êrîşên dagirker ên dewleta Tirk ev nêzî 2 mehan e li Qendîlê mertalên zindî dikin bûn.
Ciwanan li vir Êzîdiyên ku 2014'an li Koço ji aliyê çeteyên DAÎŞ'ê ve hatibûn kuştin bi bîr anîn. Endamên Yekîtiyê piştre daxuyanî dan. Li ser navê Yekîtiyê Ronî Tolhildan got, ''Em hemû gelê me yê ku bi komkujiyê hatine kuştin bi bîr tînin.''
Tolhildan bi dewam kir: ''Bi komkujiya ser gelê me hate xwestin ku Êzîdî werin tinekirin. Li dijî vê komkujiyê gelê me rêxistiniya xwe kiriye û yekîneyên xwe yên xweparastinê ava kirine. Îro li çar parçeyên Kurdistanê li ser gelê Kurd gefa komkujiyan heye, li dijî vê hişmendiya komkuj em ciwanên Êzîdî hazir in ku canê xwe bikin mertal.
Di van rojên dîrokî de ku divê em yek bin, banga me ew e ku yekîtiya netewî were avakirin û em rê nedin komkujiyên nû.
Tolhildan derbarê hatina xwe ya li ser Qendîlê got, ''Îro em ji bo ku pêşî li komkujiyê bigirin li vir in. Em dizanin ku ev hişmendiya şer û komkuj dixwaze komkujiyên mîna Koço û Til Hezir bike. Em ê jî destûra vê nedin û li dij vê her car li ber xwe bidin. Ji bo vê em li vir in. Em ê nehêlin ku komkujiyên dî çêbibin.''

## Komeleya Çerkez hate vekirin



Welatiyên pêkhateya Çerkez ên bajarê Minbicê komeleyeke xwe ya taybet ji bo xebatên xêrxwazî, çandî û civakî bi navê "Komeleya Çerkez" vekirin.
Xebatên xwebirêxistinkirina pêkhateyên herêma Minbicê bi rêk û pêk berdewam dikin. Welatiyên pêkhateya Çerkez bi armanca pêşxistina xebatên xwe yên xêrxwazî, çandî û civakî, di salvegera duyemîn a rizgarkirina bajarê Minbicê de bi merasîmekê komeleyeke xwe ya taybet bi navê "Komeleya Çerkez" vekirin.
Di merasîma vekirina komeleyê de bi dehan welatiyên bajêr û bi taybet welatiyên ji pêkhateya Çerkez û endamên sazî û komîteyên girêdayî Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê û şandeya ji Cizîrê beşdar bûn.
Merasîm bi govenda gelêrî a çerkezî li ber stranan hate destpêkirin. Piştre xwarinên ku jinên Çerkez amade kirine, hatin pêşkêşkirin.
Armanca komeleyê ew e ku pêkhateya Çerkez komî ser hev bike û çanda Çerkezî biparêze û hevgirtinê bi pêkhateyên din re xurt bike. Her wiha wê zimanê Çerkezî bi zarokên pêkhateyê bide fêrkirin.

## Emê ji bo azadiya Ocalan tekoşînê bidomînin

Welatiyên Qamişlo diyar kirin ku bi saya fikrên Ocalan biratiya gelan di navbera pêkhateyên Ereb, Kurd û Suryan de hat ava kirin. Welatiyan got, "Bi saya felsefeya wî, jinan di cikavê de azadiya xwe bi dest xist."
Welatiyên bajarê Qamişlo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kirin û diyar kirin ku dewleta Tirk bi tecrîdê hemû gelên herêmê hedef digire.
Welatiyê bi navê Ibrahîm Gulo derbarê tecrîda li ser Ocalan de axivî û wiha got, "Dewleta Tirk li her derê êrîşî gelê Kurd dike. Niha di şexsê Ocalan de êrîşî hemû Kurdan dike. Ji fikrên Ocalan ditirsin lewra têcrîdê pêk tînin. Bi fikir û felsefeya Ocalan DAIŞ li Bakurê Sûriyê hat qewtidandin. Gelên bakurê Sûriyê li ser bingeha fikrên Ocalan biratiya xwe avakirine. Em ê ji bo azadiya Ocalan heta dawiyê têkoşînê bikin."
Welatiyê ji pêkhateya Ereb bi navê Mihemed Tala jî tecrîda li ser Ocalan şermezar kir û wiha got, "bi saya fikirên Ocalan biratiya gelan di navbera hemû gelên Ereb, Kurd û Suryan de xurt bûye û bi saya felsefeya wî jinan azadiya xwe bi dest xist û rola xwe ya aktîf di hemû waran de lîst. Ocalan wekhevî û azadiya hemû gelan dixwaze."

### DIVÊ ÇALAKÎ WERIN MEZINKIRIN

Nivîskar û rojnamevan Mistefa Şêx Mihemed yê ji başûrê Kurdistanê jî diyar kir ku azadiya Ocalan ji bo çareseriya pirsgirêkên Tirkiyê û Rojhilata Navîn giringe û destnîşan kir divê ji bo azadiya Ocalan têkoşîn bê mezinkirin.
Mistefa Şêx Mihemed diyar kir ku dewleta Tirk dixwaze bi girankirina tecrîda li ser Ocalan neteweya Kurd tine bike.
Mihemed da zanîn ku nexşerêyên Ocalan ji bo çareseriya rewşa niha ya Rojhilata Navîn pir giringin û wiha dewam kir; "Ocalan pêş hemû kesê proje ji bo vê qonaxê amade kiriye û pêşkêş kiriye. Ew jî projeya xwebirêveberiyê ye. Bi vê re jî



yana gelan bi şêweyek demokratik rakxistiye. Tirkiye li dijî Ocalan e û dixwaze siyaseta xwe ya şaş berdewam bike."
Mihemed diyar kir ku di çareseriya pirsgirêka Kurd li Tirkiyê rola Ocalan pir giringe û wiha got; "Gelê Kurd bi şêweyek pir baş xwedî li Ocalan derketiye. Di vê demê de ku li girtîgehê ye, baweriya gelê Kurd hîn zêdetir kiriye. Pêwîste gelê Kurdistanê çalakiyên xwe yên ji bo azadiya Ocalan zêdetir bikin."



# Muzîk parçeyek ji jiyana gerîla ye

***Gerîla tevî şertên giran yên şer, xebatên xwe yên din jî berdewam dikin. Stran û mûzîk jî parçeyek ji jiyana gerîla ye. Gêrîla di bin her şertan de dev ji stran gotinê bernadin. Gêrîlayê bi navê Rizgar Oremar jî ku di 9'ê Tebaxê de şehîd dibe di destek wî de çek û destên din de jî tembûre.***



Gerîla li gel şerê giran wêneyan jî xêz dikin, muzîkê jî diafirînin. Rizgar Oremar ê ku meha Tebaxê şehîd bû, bi muzîkê re mijûl dibû.
Gerîlayên li Çiyayên Zagrosê ji aliyekî ve li dijî artêşa Tirk şerekî dijwar dikin, li aliyê din bi hunerê re mijûl dibin. Şert û merc çi dibin bila bibin, gerîlayên azadiya Kurdistanê ji çand û hunerê qut nabin ku beşeke xwezayî ya jiyanê ye. Li her çepereke li Herêmên Parastinê yên Medyayê, her gerîlayek herî kêm çend karan dikin. Hinek jê wêneyan xêz dikin, hinek jî muzîkê diafirînin.
Rizgar Oremar 9'ê Tebaxê li bejahiya gundê Meşkan ê navçeya Geverê ya Colemêrgê tevî hevalekî xwe heta fîşeka dawî şer kir û şehîd bû. Rizgar Oremar jî bi muzîkê re mijûl bû. Li çeperên dijwar ên Zagrosê di destekî wî de tembûr di destê din de jî çeka wî hebû. Oremar beriya şehîd bibe ji ANF'ê re axivî bû:
Rizgar Oremar wiha behsa jiyana xwe kiribû; "Navê min Rizgar Oremar e, ji gundê Oremar ê Colemêrgê me. Sala 1994'an tevlî nava rêxistinê bûm. Heval dihatin gundê me û bandor li min kirin. Me cerdevan û leşkerên çek di destan de timî didîtin. Dema ku çek di destê wan de bûn, mîna ku xwediyê dinyayê ne tevdigeriyan. Lê belê hevalên ku çek di destê wan de bûn, tevî vê yekê jî gelekî dilnizm û bi rêzdarî nêzî me dibûn. Ji xwe piştre ji ber zexta dewletê em neçar man bar bikin navenda Geverê. Li Geverê me êdî li qada siyasî dest bi kar kir."
Orema li ser biryardayîna xwe ya nava refên gêrîla jî wiha dibêje;
"Tecrîda li ser Rêbertî û şehadeta hevalên ku me ew li gund nas dikir bandor li biryara min a tevlîbûna li nava refên gerîla kir. Min berê 3 caran biryar da ku tevlî nava refên gerîla bibim, lê belê min kir nekir nebû. Herî dawî xewn û xeyalên min bi cih hatin. Piştî ku cara sêyemîn min xwest tevlî bibim, hevalan qebûl kirin. Malbata min malbateke welatparêz e, çar zarokên min hene."
Gêrîla Oremar li ser lêxistina xwe ya tembûrê ji van gotinan tîne ziman;
"Ji zarokatiya xwe ve ez distirêm.



Bala malbata min li ser muzîkê ye. Di nava malbata min de çanda dengbêjiyê xurt e. Hîn ez biçûk bûm, mezinên malbatê kilamên dengbêjiyê digotin. Ji zarokatiyê ve bala min li ser tembûrê bû. Wê wextê rewşa me ya aboriyê nebaş bû, em xizn bûn. Malbata min nikarîbû tembûrê bikire. Min jî ji xwe re ji sandoqeke ji text tembûrek çêkir. Û bi wê hînî lêdana tembûrê bûm. Cihê tembûrê her tim di jiyana min de hebû. Bêguman bi dirêjbûna emr re kêmcaran me li tembûrê xist. Lê piştî ku tevlî nava refên gerîla bûm, min ji jiyana gerîla bêhtir moral girt. Ji çiyayên bedew ên welatê xwe moralê digirim. Li van çiyayan ahenga her tiştî heye. Gerîla pê re aheng e. Dema mirov gerîla be, mirov xwe weke beşek ji xwezayê dibînin. Muzîk êdî ji bo min tê wateya ahengiya gerîla û xwezayê."

## Rewşenbîr hêza pêşeng a çareseriyê ye



**Idrîs HENAN**

Hevserokê Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê wêjevan û rexnedar Usama Ehmed rola rewşenbîran di yekemîn qonaxa Berxwedana Serdemê de nirxand û ev tişt anî ziman: Di sêyemîn roja berxwedanê de me maseyeke aloziyê lidar xist. Me biryar da ku bibin hêzeke civakî û bi çalakiyên curbecur him di nav gel de û him jî li çeperên berxwedanê erkên dikevin ser milê me pêk bînin. Ev jî bi koordîneya bi saziyên peywendîdar re hate organîzekirin. Ehmed got ku wan di aliyê civakî de gelek semîner, hevdîtin, alîkariya komînan, bicihkirina gelê ji gundan hatiye, çareserkirina pirsgirêkan û çalakiyên hunerî ku rastiya êrîşkaran rave dikin, li dar xistin. Li çeperan jî destekdayîna tubî, lojistîk û moral bû. Ji bo vegotina heqîqetê jî rewşenbîr bê navber di nav tevgerê de bûn. Ehmed di vê derbarê de got: Ji bo rastiya dîrokî, kêlî bi kêlî 58 rojên berxwedana gelê Efrînê hatin tomarkirin û gelek bernameyên parvekirina nerînan bi gel re li saheyên Efrînê hatin lidarxistin.

### HEJMAR KÊM BÛYE!

Ehmed derbarê rewşa piştî dagirkirina Efrînê de ev tişt got: Rewşenbîran jî para xwe ji êşa koçberiyê girtin. Lê di demeke kurt de, li cihê ku lê diman tevlî karê rêxistinkirina gel bûn. Ehmed destnîşan kir ku; piştî koçberiyê jimara rewşenbîran li Şehbeyê kêm ma. Li gorî qeydên Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê jimara tomarkirî 150 bûn. Lê mixabin niha em li ser tiliyan tên hesibandin! Vê yekê jî bandor li karê me kiriye.

### WÊ QEHREMANIYA KURD BÊ VEGOTIN

Ehmed derbarê xebatên xwe birêxistinkirinê û beşdarbûna Konferansa Rizgarkirina Efrînê de ev tişt parve kir: Pênc endamên me bi awayekî çalak beşdarî konferansê bûn. Di encama nîqaşên berfireh de, biryarên girîng derketin. Derbarê rol û misyona rewşenbîran de konferansê tekez kir ku pêwîste rewşenbîr cih xwe di xebatên dîplomsî de bigirin. Ji bo belgekirina herdu qonaxên Berxwedan Serdemê jî pêşengtiyê bikin. Ta ku ev kar bi ser bikeve, bi desteka Çand û Huner, hemû derfet ji rewşenbîran re bên dabînkirin.
Ehmed ji bo aliyê rêxistinî jî got: Piştî sekn û soza me ya di konferansê de, êdî me weke sazî xwe birêxistin kir û erkên demê hatin parvekirin. Di encam de gelek proje hatin pêşniyarkirin. Hinek wê bi koordîneya bi Çand û Huner re bin, hinek jî wê bi keda rewşenbîran bin. Projeya me ya mezin ew e ku; bi têkîliya bi Saziya Malbatên Şehîdan re serdana malbatên şehîdan e. Bi van serdanên me re wê qehremaniya hemû şehîd, birîndar û bînerên Berxwedana Serdemê tekûtek bi awayê belgefîlm, çîrok, helbest, roman û nivîs bibin dîrok. Ji bo ku qehremaniya Kurd bi cîhanê bidin nasîn, em ê berhemên xwe wergerînên gelek zimanên dîtir.

### JI BO CIWANAN PERWERDE

Li ser rola ciwanan di xebatên rewşenbîriyê de Ehmed ev tişt got: Bê beşdarbûna ciwanan kar encamgir nabe. Ji bo ku erkên me di demeke nêz de li gorî taybetmendiyên qonaxê pêk werin, em ê van rojan bi awayekî zanyarî dest bi perwerdeya ciwanan bikin. Wê perwedekar weke ekîpekî alîkar li ser hîmên nîvîskariya şoreşger tev bigerin. Destpêkê wê dersên herdu zimanên Erebî û Kurdî, nîvîsandina çîrok û sînaryo bên dayîn. Her waneyek jî wê demildest pratîze bibe.

### XWE JI DAGIRKERIYA ZIHNÎ RIZGAR BIKIN

Ehmed di nav nirxandina xwe de behsa hinek taybetmendî û xisletên rewşenbîran kir û ev tişt li gotinên xwe zêde kir: Bi giştî rewşenbîr xwedî rola pêşeng e. Di pêvajoya Şoreşa Rojava de diyar bû ku rewşenbîrên me gelekî dilxwaz, dilpak û sade ne. Lê mixabin dereng dereng kar dikin! Li gorî rewşenbîrên dunyayê ku şoreşên welatên xwe bi rê ve birine, nekarîne bigihin asta pêşengtiyê. Rewşenbîrên me piştî dagirkirina Efrînê melûl man. Pêwîste li gorî birîna kûr, sekna bi rûmet, berxwedana bê hempa û hêviyên mezin ên gelê me xwedî hêza pêkanîna bendewariyên gel bin. Gereke ji vir û pê ve di hemû aliyên civakî, siyasî, dîplomasî û leşkerî de bibin pêşeng û xwedî vîna çareseriyê bin. Pêwîste bi çavên civakê ne weke elît û tebeqe li xwe binêrin. Yanê zanebûna xwe bikin mala giştî û ya giştî jî hembêz bikin û xwe ji dagirkeriya zihnî rizgar bikin.

### LI GORÎ BIRYARÊN KONFERANSÊ TEV BIGERIN!

Hevserokê Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê Usama Ehmed dawiyê de got: Ji bo ku rewşenbîr xwe ji halê heyî xilas bike, pêwîste rêveberiya heyî jî nêzîkatiyên xwe ji rewşenbîran re li gorî biryarên Konferansa Rizgarkirina Efrînê sererast bike. Lê mixabin ji konferansê û vir de ti aliyekî rêveberiyê berê xwe nedaye rewşenbîran. Ev jî cihê rexnê ye.

## Li Minbicê pirtûkxaneyek hatin vekirin



Di çarçoveya çalakiyên salvegera duyemîn a rizgarkirina Minbicê de, Yekitiya Rewşenbîran navendeke xwe li bajêr vekir, her wiha Komîteya Çand û Hunerê jî pirûkxaneyeke navendî vekir.
Merasîma vekirinê, bi beşdariya endamên saziyên Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê û şandeyên ji herêmên Bakurê Sûriyê pêk hat.
Piştî bîranîna cangoriyên azadiyê, Endamê Yekitiya Rewşenbîran Ehmed El-Yûsif axivî û xêrhatina beşdaran kir. El Yûsif da zanîn ku vekirina pirtûkxane û navenda rewşenbîran erka wan e ku zanebûnê di nava gel de belav bike û ew bibe cihê hemû rewşenbîran.
Bi navê Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê Mihemed Mihemed Xêr El-Şêxo jî axivî û salvegera rizgarkirina Minbicê li hemû beşdaran pîroz kir.
Ji herêma Cizîrê jî bi navê Yekitiya Rewşenbîran Leyla Îbrahîm axivî û vekirina navenda Yekitiya Rewşenbîran û pirtûkxaneya navendî pîroz kir.
Mihemed Qeberdayî bi navê Rêveberiya Komîteya Çand û Hunerê ya Minbicê axivî û da zanîn ku wê hemû rewşenbîrên Minbicê cihê xwe di vê navendê de bigirin û ev gaveke erênî ye.
Piştî axaftinan, helbest jî hatin xwendin, paşê deriyê Navenda Yekitiya Rewşenbîran û pirtûkxaneya navendî bi navê Mihemed Menla Xezîl hatin vekirin. Yekitiya Rewşenbîran di 21`ê Nîsana 2018`an de hate vekirin…*ANHA*

# Mamosteyan 15'ê Tebaxê pîroz kirin

**Bi minasebeta bi dawîkirina dewreya perwerdeyên mamosteyan yên kantona Kobanê û Salvegera Pêngava 15'ê Tebaxê Desteya Perwerdê ya Kantona Kobanê şahî lidarxist. Hêjmareke zêde mamoste beşdarî şahiyê bûn. Li ser navê Desteya Perwerdê Doz Şekir axivî û cejna vejînê li ger û şehîdan pîroz kir.**

Bi boneya bidawîkirina perwerdeyên mamosteyên kantona Kobanê û salvegera Pêngava 15`ê Tebaxê ya 34`emîn, Desteya Perwerdeyê ya Kantona Kobanê şahî li 3 dibistanên cuda li dar xistin.

Şahî li Dibistana Şehîd Hogir, Şehîd Seydo yên navenda bajarê Kobanê û li dibistana navçeya Şêranê ya girêdayî bajarê Kobanê hatin lidarxistin.

Perwerde berî niha bi du mehan bi tevlêbûna hezar û 150 mamosteyên asta seretayî, navîn û amadehî dest pê kir. Mamosteyan perwerde li ser materyalên sala 2018-2019`an dît.

Li ser vanê Desteya Perwerdeyê daxuyaniyek ji aliyê endama Desteya Perwerdeyê Doz Şekir ve hate xwendin.

Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin: "Em Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk a Herêma Firatê salvegera vejîna têkoşînê di serî de li rêber Apo, li gelê xwe û li tevahî têkoşerên azadiyê pîroz dikin. Cejna Vejînê ya 15`ê Tebaxê ji bo milyonan hêviya jiyana azad afirandiye û têkoşîna berxwedanê veguherandiye vejîneke mezin.

Di kesayeta fermandarê me yê efsanewî rêheval Egîd de li tevahî şehîdên şoreşê pîroz dikin, bi hezkirin û rêzdarî bejna xwe li hemberî wan ditewînin."

Piştî daxuyaniyê şahî bi stran, helbest û govendê bi dawî bû.



## EWROJ



### 15'ê Tebax

Farûq SAKIK

Ji çalakiya Erûhê re Egîd-Mahsûm Kormaz wê fermandarî bikira. Ew jî li Bakûr bû û ji bo bicihkirina hêzên HRK'ê dixebitî. Dema ku jêre biryara çalakiyê hat, ew li herêma Çaraxan bû.

Komek biryar û fermana çalakiyê ji bo bigîhînin Egîd birê ketin. Di nav vê komê de Egîd Botî jî hebû:

"Dema hê çalakiyê destpênekiribû, gotin rabin vê biryarê ji heval Egîd re bibin Besta. Em 8 heval çûne devera Besta. Li wê derê me belavoka 15ê Tebaxê radestî Egîd kir. Heval Egîd, bi me re civînek li dar xist û got ji bo 3 roj şûnde amade bin. Dema Egîd biryara çalakiyê girt, dest bi amadekariyan kir. Berê jî amadekariyên wî hebûn. Dest bi kefşê kir. Bi hin kesên ku bawerî bi wan anîbû re ket têkiliyan.

Egîd piştî ku yekîneyên 15ê Tebaxê kom kir, bi xwendina belavokê, HRKê îlan kir. Bi 2 hevalan re derbasî Erûhê bû û li vê derê keşf kir. Li ser maketek 3 rojan tetbîkata çalakiyê kirin.

Ji bo çalakiyê 5 komên êrîşê û 2 komên parastinê hatin avakirin. Fermnadarê koma qereqolê Erdal bû. Alîkarê wî jî Fevzî Aslan bû. Mehmet Sevgat fermandarê koma Lojmanan bû. Mustefa Çîmen jî berpirsyarê koma propagandayê bû. Berpirsyarê koma Bankê jî Botan bû. Kazim Kûlû jî fermandarê koma ku gel li Qehwexaneyan kom bike bû, diviya ku propaganda bike û Pankartan daliqîne. Mûstafa Yondem jî wek cîgirê Egîd hat wezîfedarkirin. Piştî van saeta çalakiyê hat destnîşankirin.

**EWROJ....**

15 Tebaxa 1984 bû. Li navçeya Erûhê jiyanek normal hebû. Haya tu kesî jê tune bû hin şervanên Kurdan li derdora navçeyê, ji bo guhertina çarenûsa gelek li benda saet 21.00 in.

Û ew dem hat. 15ê Tebaxa 1984an li Erûhê, li dijî zilma dewleta tirk ya salan, deng bi çekan ket.

Çalakî saetek dewam kir. Di 10 deqîqeyan de gihîştin hedefê xwe. Bi tenê koma Bankê bi ser neket. Midurê Bankê dema dengê çekan dibihîze baz dide û xwe vedişêre. Gerîla di demek kurt de hemû navçe girtin bin kontrola xwe. Di aporloyan de belavoka ku berê hatibû amadekirin hat xwendin. 112 leşker dîl hatin girtin û piştî çalakiyê serbest hatin berdan. Hêzên gerîla windahî nedan. Bi tenê bi navê Ferhan gerîlayek ji tiliya xwe sivik birîndar bû. Gelek çek û cebilxane bidest xistin û ji bajêr derketin.

Egîd û hevalên xwe li dû xwe xirbeyek ji dewletê û hêvî baweriyek mezin jî di nav gel de hiştin û çûn.

Hêzên ku tevlî çalakiyan bibûn bi kordîne vekişiyan bargehên xwe.

**DORA ROJÊ.....**

Dora rojê dengê vê fîşeka yekem li Kurdistan, Tirkiye û li hemû cihanê hat bihîstin. Bi vê çalakiyê hêviyên gel yên ku bi salan bû hatibûn windakirin, ji nû de zindî bûn.

Hemû kadro û rêvebirên PKKê li ber radyoyê li benda encamê çalakiyê bûn. Ew nûçeya ku li bendê bûn, 16'ê Tebaxê jî ji ajansan derbas nebû.

17'ê Tebaxê di BBC de, di nûçeyên şevê de, ew nûçeya li bendê bûn derbas bû. Gelek kesan bi vê nûçeyê çalakî bihîst.

Piştî çalakiya 15ê Tebaxê, medyaya Tirkiyeyê ji bo reşkirina vê çalakiyê dest bi weşanek taybet kir. Li herêmê jî operasyonên leşkerî hatin destpêkirin. Li Kurdistan êdî dem, dema şer bû.

Çalakiya 15ê Tebaxê tirs û xofa ku bi salan di nav Kurdan de hatibû afirandin parçe kir. Hêvî û baweriyên azadiyê da. Piştî 15ê Tebaxê êdî li Kurdistanê hêzên Kurdan ên çekdarî hebûn. Roj bi roj cîwanên Kurdan berê xwe didan çiya û tevlî van refên gerîla dibûn.

## Amadekariyên çandina sebzeyên payîzê tê kirin



Piştî bidawîkirina çandina demsala havînê, cotkarên navçeya Tirbespiyê amadekariyên çandina sebzeyên payîzê dikin. Cotkaran bang li saziyên têkildar ên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk kirin ku cureyên baş ji dermanên li dijî nexweşî û kurmikên bizirar ji wan re peyde bikin.

Di nav çend salên dawîn de, çandiniya sebzeyan li navçeya Tirbespiyê geş bûye. Şêniyên navçeyê debara jiyana xwe bi çandiniyê dikin. Her wiha Rêveberiya Xweseriya Demokratîk semad, derman û sotemenî ji cotkaran re peyde kirin.

Niha cotkarên navçeyê ji bo çandina sebzeyên payîzê wekî xiyar, bacanên reş, pîvaz, kelem û amadekariyan dikin. Girêdayî mijara pêşketina çandiniyê li navçeyê cotkarê bi navê Şahîn Mûsa diyar kir ku çandiniya sebzeyan li navçeyê roj bi roj geş dibe. Mûsa da zanîn ku niha wan pêngava xwetêrkirinê derbas kirine û di du salên borî de cotkarên navçeyê berhemên sebzeyan ên navçeyê derxistin bajar û herêmên din li Bakurê Sûriyê.

Mûsa destnîşan kir ku çandiniya sebzeya li navçeyê piştî eleqedariya cotkar û aliyên têkildar geş bûye.

Di dawiyê de Şahîn Mûsa ji saziyên pêwendîdar ên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk xwest ku ji wan re dermanên li dijî nexweşî û kurmikên bizirar peyde bikin…

*ANHA*

## Oldaran hovîtiya dewleta Tirk li dijî gorên şehîdan şermezar kirin

Yekitiya Oldarên Dêrikê û Meclisa Rûspî û Eşîran a herêma Cizîrê destdirêjiya artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê li dijî gorên şehîdan ên herêma Efrînê şermezar kirin. Oldar û rûspiyan piştrast kir ku ev kirinên wan derveyî nirxên exlaqî û pîvanên olî ne.

Di çarçoveya helwestên li dijî hovîtiya artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê de li herêma Efrînê, Yekitiya Oldarên Dêrikê li Navenda Olan çalakiyek li dar xist û bi daxuyaniyekê destdirêjiya dagirkeran li gorên şehîdan ên herêma Efrînê bi tundî şermezar kir.

Daxuyanî ji aliyê endamê rêveberiya Navenda Olan Seîd Husam ve hate xwendin û hemû şehîdên rûmetê û mirovahiyê hatin bibîranîn. Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin: "Li ser navê oldarên Dêrikê em hovîtiya artêşa Tirk û komên çete yên girêdayî wê li Efrînê bi tundî şermezar dikin. Tu ol û şerîetên Xweda û ne jî pîvanên mirovî û pîvanên navneteweyî destdirêjiya li dijî mezarên şehîdan qebûl nakin. Ev kirinên artêşa Tirk li Efrînê heman kirin û destdirêjiyên terorîst in."

Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku tu carî ola îslamê fermana destdirêjiya mirovan nade û heman tişt di belgeyên navneteweyî de hatiye piştrastkirin.



Girêdayî heman mijarê Meclisa Rûspî û Eşîran a herêma Cizîrê daxuyaniyek da. Daxuyanî ji aliyê Şêx Sînan Ehmed ve li navenda meclisê hate xwendin. Di vê daxuyaniyê de jî wiha hate gotin: "Em van destdirêjiyên hovane û tirsonek ên çeteyên Erdoganê mongolî û koleyên wî ku xwe wek artêşa azad bi nav dikin, li dijî mezarên şehîdan ên herêma Efrînê bi tundî şermezar dikin. Hovîtiya atêşa Tirk û çeteyên wê li dijî xanî û dar û beran jî pêk hat. Artêşa Tirk û çeteyên wê xaniyên sivîlan hilweşandin û daristanên herêmê dişewitînin. Her wiha destdirêjiyê li gorên şehîdan dikin ku rihê van şehîdan wek dirindeyan di jiyana van çeteyan de ye.

Lehengiya şehîdan bêguman dê veguherin dibistanên jiyana azad û her çi qas hovîtiya van komên terorîst û artêşa Tirk li dijî gelên herêmê zêde bibe, tu carî vîna azad a van gelan naşikê.

Bêhna xwîna şehîdan hêza me di parastina rewa de xurttir dike û tu hêz nikarin nasnameya me tune bikin. Em rehmeta şehîdan ji Xweda dixwazin. Bimire dewleta Tirk a faşîst."



# Ez ji Kurdan fêrî azadiyê bûm

***Jina ji Misrê ya bi navê Nihmet Tewfîq ku ji destên çeteyên DAIŞ'ê hat rizgar kirin diyar kir di nav DAIŞ'ê de wan jiyaneke gelek bi zilm û zehmet derbas kir. Jina Misrî wiha got, "Min dixwest tenê ez ji DAÎŞ'ê xelas bibim. Bi rizgarkirina bajarê tebqayê re şervanên QSD'ê em xelas kirin. Ez ji Kurdan fêrî wateya azadiyê û jiyana bi rûmet bûm.***



Jina Misrî Nihmet Tewfîq a ku bi xapandina hevjînê xwe tevlî çeteyên DAIŞ'ê bû, piştî ku hat rizgarkirin got, "Bi naskirina jinên kurd re ez fêrî wateya azadiyê û jiyana bi rûmet bûme."

Nihmet Tewfîq jina 30 salî ku ji Misrê tevlî çeteyên DAIŞ'ê bû ye, piştî ku hevjînê wê zarokên wê revandin û ew mecbûrî tevlîbûna nav çeteyên DAIŞ'ê kiriye ye.

Nihmet da zanîn ku jiyana li gel DAIŞ'ê pir bi zilm bû û wiha got, "Dema em ketin nava DAÎŞ'ê jiyaneke pir zehmet û tund me jiya. Heta ji jiyana li Misrê zahmetir bû. Kuştin, tecawizkirin, işkencekirin , koletî û her rengên deshilatdariyê yên ku mirovan tûne dikin li gel wan hebû. Gelek caran min dixwest ez birevim lê her carê leşkerên tirk ji ser sînor min vedigerandin. Wekî din jî tu rê tune bû. Dema ku me berê xwe dida kesipkaran wan jî em dixapandin û pereyê me dibirin. Bila herkes bizane ku Tirkiyê alîgirê DAÎŞ'ê ye û gelek çete derbasî sûriyê dikirin û ew bi çek dikirin ji bo şerê kurdan bikin."

Nihmet destnîşan kir ku piştî rizgarkirina wê ji destê DAIŞ'ê êdî ew jineke xwedî hêz û biryar e û wiha got: "Hevjînê min di şerê Tepqayê de hat kuştin, piştî kuştina wî ez bêhtir bi hêz bûm. Min dixwest tenê ez ji DAÎŞ'ê xelas bibim. Bi rizgarkirina bajarê tebqayê re şervanên QSD'ê di nava sivîlan de em xelas kirin. Tevî min tû carî kurd nas nedikirin jî ez kêfxweş bûm. Ez ji kurdan fêrî wateya azadiyê û jiyana bi rûmet bûm. Heqîqeta şervanên kurd yên ji bo mirovahiyê şer dikin min naskir, ez pir kêfxweş im li gel wan ,ez niha tenê dixwazim jiyaneke azad bi zarokên xwe re bijîm û dûrî hemû civakên deshilatdar bikevim."…

***JINNEWS***

## Divê jin li hember êrîşan hevbigrin



Helbestvana Kurd Şêraz Hemo diyar kir ku pergalên kapîtalîst di êrîşên xwe yên li ser Kurdistanê de di serî de jinan dikin hedef, li hemberî van êrîşan divê jin hevgirtinê xwe xurt bikin.

Helbestvana Kurd Şêraz Hemo destnîşan kir ku pergalên desthilatdar û hêzên kapîtalîst û di serî de jî dewleta Tirk a dagirker bi êrîşên xwe yên li ser Kurdistanê beriya her tiştî jî jinan dikin hedefa xwe.

Şêraz Hemo diyar kir ku her çend gelê Kurd li hemberî êrîşên dijber têkoşîna xwe ya daxwaza mafan mezin dike, hêzên dijber jî li beramberî wê êrîşên xwe zêde dikin. Şêraz destnîşan kir ku dijminên gelan di serî de jî dewleta Tirk li dijî gelê Kurd bi hemû rêbazan hewl dide dîrok û çanda Kur ji holê rake û wiha got, "divê gelê Kurd li hemberî van komployan hişyar be û piştgiriya projeya demokratîk bike."

Şêraz da zanîn ku di êrîşan de herî zêde jin dibin qurbanî û wiha got: "Ji ber jin hêza sereke ya civakê ye, ew jî ji bo tunekirina civakê destpêkê jinan dikin hedef."

Helbestvana Kurd li hemberî êrîşên bi armanca têkbirina îradeya jinan bang li jinan kir ku hevgirtin û birêxistinbûna xwe xurt bikin.

Şêraz Hemo rola rewşenbîran di vê pêvajoyê de anî ziman û got: "Kurdistan di pêvajoyeke çarenûsî û hestiyar re derbas dibe, divê em giraniya vê pêvajoyê nas bikin. Ji bo wê divê jinên rewşenbîr jî li rewşê haydar bin û rewşê analîz bikin."…***ANHA***

## Jin zimanê dayîkê diparêze



**Şîlan XOCE**

Ji bo perwerdeya bi zimanê dayîkê KPC-Demokratîk li herdu kampên Berxwedan û Serdem refên perwerdeya astên ziman dest pê kiriye.

### ROLA JINÊ DIYARKER E

Mamosteya zimanê Kurdî Ofê Reşîd ku nişteciya Kampa Berxwedan e di vê derberê de got: Dijminê gelê Kurd her berê xwe daye qirkirina zimanê Kurdan. Lê bi ked û têkoşîna jinan zimanê Kurdî hatiye parastin. Ofê bal kişand ser girîngiya zimanê dayîkê û ev tişt anî ziman: Jina Kurd malbat li dora xw kom kir û bi zimanê dayîkê perwede kir. Li hemberî hewldanên pişaftin û asîmîlasyonê, rola jina Kurd di parastina ziman de diyarker û pêşeng bû.

Ofê bi bîr xist ku dagirkeriya Tirk di serî de li Efrînê sazî û dezgehên fêrkirinê hedef girt û got: Dibistanên me ku piraniya mamosteyên wan jin bûn, armanca yekemîn a êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên wê bûn. Dizane ku encax bi riya qirkirina ziman civaka me têk bibe. Lê heya ku jin pêşeng be zimanê Kurdî zindî ye.

### JI BO 40 JINAN DERSÊN ZIMAN

Ofê tekez dike ku piştî koçberiya bi zorê û bi cihbûna li Şehbayê KPC-Demokratîk xwe ji nû ve bi rêxistin kir û dest bi vekirina dibistan kir û ev tişt li gotinên xwe zêde kir: Komîteya Perwerdeya Civakî KPC-Demokratîk li Şehbayê ji bo parastina zimanê dayîkê demildest xwe bi rêxistin kir. Li ser daxwaza jinên ku li Kampa Berxwedan dimînin, perwerdeya astên zimanê Kurdî ji bo 40 jinan hate destpêkirin.

Mamosteya zimanê Kurdî li Kampa Berxwdan Ofê Reşîd dawiyê de ev tişt anî ziman: Çawa ku jinê ji serdema civaka xwezayî ziman parastiye, wê ji vir û pê ve jî xwedî li zimanê dayîkê derkeve. Wê hemû hewldanên qirkirina çandî têk bibe û bi têkoşîna xwe wê rê li ber pişaftinê bigire.

## Bi 15'ê Tebaxê artêşbûna jinê pêşket

Zozan Çewlig diyar kir ku Pêngava 15'ê Tebaxê xeta şerê gelê şoreşgerî ye. Bi xwe re xetek û hişmendiyek nû afirandiye. Ev xeta azadiyê bîr û baweriyek e, alternatîfa jiyana azad e.

Fermandara Biryargeha Navendî ya YJA Starê Zozan Çewlig bi wesîleya salvegera 34'an a Pêngava 15'ê Tebaxê bû mêvanê Bernameya Taybet a Stêrk TV û Pêngava 15'ê Tebaxê ya si aliyê jinan de nirxand.

### JIN PÊŞENGÊN ŞOREŞÊ NE

Zozan bal kişand li ser bandora Pêngavê ya li ser jinê û wiha got, "Cewherê welatparêzî û parastina Kurdbûyînê pêwîste di cewherê jina Kurd de were dîtin. Bi derketina Serokatî re jina Kurd jî bûye xwedî statûyek. Cardin di kêliya herî destpêkê de beşdarê şoreşê dibe. Beşdarê PKK û gerîlatiyê dibe. Em weke YJA Star gava li dîroka xwe dinêrin bi taybetî jî di pêşengtiya rêheval Sara ya berxwedaniya girtîgehan de, cardin di biryara yekemîn de vegera Kurdistanê çê dibe, ango biryara şerê çekdarî were destpêkirin, di pêşengtiya heval Azîme, Rehîme, Çîçek, Besê, Xetîce û rêheval Hewayan de bîr û baweriyek mezin hatiye avakirin. Gelek hevalên me yên jin weke pêşeng di nava vê berxwedaniyê de cih girtine. Ger ku em îro qala dîroka jin dikin û di nava şoreşê de avabûna şoreşê dikin, bêguman em ji pêngava 15'ê Tebaxê qut nagrin dest.



Bêguman ji bo vê jî Serokatî kedek gelek mezin daye. PKK pirsgirêka jin digre navenda azadiyê û tevahî azadiyan. Bi beşdarbûyina jin re tecrûbeyên mezin hatin dest girtin. Ev jî bi xwe re da diyarkirin ku wê jin cihê xwe nava şerê parastinê de bigre. Wê pêşengtiyê jî jêre bike. Di Kurdistanê de ev bi serê xwe şoreş e. Cardin artêşbûyina jin jî li ser tecrûbeyên pêngava 15'ê Tebaxê, ruhê wê ava dibe. Ji bo jin jî mîrasên fermandartiyê, xwe parastinê û pêşengtiyê derdixe holê. Jina Kurd bi hebûna xwe û rengê xwe beşdarê şoreşê dibe. Artêşbûyîna jin hişmendî û rêxistinbûyîna jin derdixe holê. Em dikarin bibêjin ku artêşa jin YJA Star di hêla fermandartî, pêşengtiya jin, parastin û biryarbûyîna jin de jî bûye xwedî hêzek gelek mezin. Jina Kurd di roja me ya îro di tevahî aliyan de pêşengtî ji tevahî jinan re û mirovahî yê re dike. Di berxwedanî, taxtîk, pêşengtî, jiyan û di şerê xwe de jî vê rastiyê derxistiye holê. Pêwîste em baş bizanin ku ger jin nikaribe xwe bi parêze wê nîkaribe qala azadiyê jî bike. PKK û YJA Star di vê mijarê de jî ferqa xwe daniye holê. Çawa ku di roja me ya îro de şêwaz, kesayet û fermandartiya Egîdan nayê binxistin, di pêşengtiya rêheval Bêrîtan, Zîlan, Besê û jina ku bûye xwedî artêş jî wê ti carî bin nekeve. Nêrîn, şêwaz, vîn û şerê jin guhertinên bingehîn da avakirin. Em dikarin bibêjin ku di şoreşa Kurdistanê de jin pêşenge. Fikir, raman û birdoziya Rêber APO ev hêz û baweriyê da avakirin. Li ser vê baweriyê ne tenê di Kurdistanê de di tevahî perçeyên Kurdistanê de ji bo tevahÎ jinan bûne hêviyek mezin. Di Kurdistanê de rêgezê herê bingehîn jî rêgeza xwe parastinê ye. Pêwîste her kes vê baş bizene."

# Minbic bi kedeke mezin hat rizgarkirin

***Hevserokê Meclisa Zagonsaz a Rêveberiya Sivîl a Minbicê Farûq El-Maşî bi minasebeta salvegera duyemîn a rizgarkirina Minbicê ji DAIŞ'ê axivî û diyar kir ku Minbic bi saya ked û xwîna şehîdan hat rizgarkirin. El Maşî da zanîn ku Minbic niha bajarê herî bi ewle ye û bang li gelê Sûriyê kir ku tevlî avakirina Sûriya nû bibin."***

Hevserokê Meclisa Zagonsaz a Rêveberiya Sivîl a Minbicê Farûq El-Maşî diyar kir ku bajarê Minbicê yek ji bajarên herî bi ewle ye. El-Maşî da zanîn ku hemû destkeftiyên li Minbicê bi saya xwîna şehîdan pêk hatiye.

Bi boneya 3`yemîn salvegera rizgarkirina bajarê Minbicê, Hevserokê Meclisa Zagonsaz a Minbicê Farûq El-Maşî axivî diyar kir ku li bajarê Minbicê pêşketinên mezin çêbûne û li ser asta Sûriyê bûye bajarê herî ewle.

El-Maşî diyar kir ku çeteyên DAIŞ`ê li Minbicê gelek kiryarên hovane kirin û komkujî li dijî gel pêk anîn, lewma welatî û rûsipiyên herêmê hawara xwe gihand Meclisa Leşkerî ya Minbicê ku wan ji çeteyan rizgar bike.

El-Maşî wiha dewam kir: "Di 5`ê Nîsana 2016`an de me Meclisa Sivîl a Minbicê damezirand, wê çaxê hîna bihostek axa Minbicê nehatibû rigarkirin, jixwe hemle di meha Hezîranê de dest pê kir, em gav bi gav li kêleka meclisa leşkerî bûn, me giranî da avakirina meclisan."

El-Maşî ku wê demê bûbû serokê Meclisa Sivîl a Minbicê diyar kir ku wan destpêkê giranî da qada perwerdeyê û got: "Me 'got perwerde berî xwarinê', welatî û mamosteyan jî alîkarî da me û bi dilxwazî xebitîn, me karî qada perwerdeyê vejînin."

Her wiha di qadên tenduristî û xizmetguzariyê de jî hin gav hatin avêtin. Bi rizgarkirina bajêr re toreyên elektrîkê hatin sererastkirin û bajar ji mayinan hate paqijkirin.



El-Maşî got ku wan roj û şevên xwe kirin yek, li gund û taxan civîn li dar xistin, erkên giran ketibûn ser milê jinan jî, tevî germahiya havînê û kêmbûna derfetan jî, lê jinan xebateke mezin bi rê ve bir.

El-Maşî diyar kir ku piştî bajar bi ewle bû, di 13`ê Adara 2017`an de Rêveberiya Sivîl a Demokratîk li Minbicê hate avakirin û rewşenbîr, êl, jin, ciwan û hemû pêkhate beşdarî nava rêveberiyê bûn. El-Maşî wiha axivî: "Destkeftiyên li Minbcê hatin bidestxistin ne hêsan bûn, bi xwîn û keda zarokên me pêk hatin."

## MINBIC BAJAREKÎ BI EWLE YE

El-Maşî bal kişand ser avakirina bajêr û rewşa parastin û ewlehiyê û ev tişt anîn ziman: "Minbic bajarê herî ewle ye, şandeyên ku serdana me kirin jî ev tişt dîtin, ev jî bi ked û xebata meclisa leşkerî, hêzên ewlehiyê û ciwanên herêmê pêk hat, em rewabûna xwe ji gelê xwe digirin."

El-Maşî, diyar kir tişta ku hiştiye Minbic bikaribe li dijî hemû astengiyan li ber xwe bide, têkoşîn û fedekariya şehîdan e û wiha got: "Minbic bi saya xwîna şehîdan karîbû li dijî êrîşan li ber xwe bide, dema em diçin serdana goristana şehîdan em dîbînin ku gora şehîdên ji pêkhateya Ereb li kêleka yê Kurd û Çerkes û Tirkmen e, çaxê çavê mirov bi gorên ew qas şehîdan dikeve, mirov tê digihîje ku destkeftî bi hêsanî çênebûne."

El-Maşî da xuyakirin ku bajarê Minbicê bûbû rêya hevgihînê di navbera çeteyên li Reqayê û Tirkiyê de û got: "Tirkiyê sînorên xwe ji çeteyan re vekiribû, li ber çavên cîhanê ev tişt çêdibûn, her kesî Minbic paşguh kiribû, AKP`ê û rêjîma Sûriyê çima nehat û Minbic rizgar nekir?"

El-Maşî diyar kir ku QSD`ê erkê rizgarkirina hemû deverên Sûriyê daye ser milê xwe û alîkariyeke mezin da têkoşîna rizgarkirina Minbicê.

## BERPIRSYARIYÊN ME MEZIN E

El-Maşî diyar kir ku ew hewl didin rewşê baştir bikin, ew dizanin hin kêmasî hene lê hewl didin wan derbas bikin û got: "Berpirsyariyên giran li ser milê me ne, em zarokên vî welatî ne, mafê gel li ser me heye, yên şehîdan jî, lewma em soz didin ku li gorî hêviyên wan bin."

El-Maşî di vê derbarê de bang li hemû gelên Sûriyê kir û wiha got: "Werin em bi hev re Sûriyeke nû ava bikin, terorê rawestînin û nifşekî nû ava bikin."…***ANHA***

# Bi ruhê 15'ê Tebaxê berxwedan dewam dike

Konseya Rêveber a KNK'ê bi wesîleya salvegera Pêngava 15'ê Tebaxê daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Di destpêka daxuyaniyê de işaret bi zilm û zordariya cûntaya faşîst a 12'ê Îlona 1980'î hate kirin û hate gotin, "Di wê atmosfera dijwar de têkoşîn û berxwedaneke wêrekane hate nîşandan û bi teqandina fîşeka 15'ê Tebaxê ya 1984'ê, banga azadî û rizgariya Kurd û Kurdistanê li seranserê Kurdistan, Tirkiye û Dinyayê careke din hate îlan kirin."

## ÇIRÛSKA ŞOREŞA KURDISTANÊ

KNK'ê diyar kir ku bi wê hewildanê re çirûska şoreşa Kurdistanê îro bû agirekî gur û geş li welat û Rojhilata Navîn û wiha dewam kir: "Egîdê egîdan bi komeke şervanên azadiyê dest pê kirin û îro bûne hêzeke mezin a gerîla li Kurdistanê û Rojhilata Navîn. Ev bi serê xwe serkeftineke. Pêngava 15ê Tebaxê li xelkê Kurd, xelkên Kurdistanê û




Rojhilatanavîn pîroz be."

## BERXWEDANEK BI RUHÊ 15'Ê TEBAXÊ HEYE

Konseya Rêveber a KNK'ê da xuyakirin ku di salvegera 34'an a Pêngava 15'ê Tebaxê de dewleta Tirk êrîşkariya xwe bi hemû rê û rêbazan didomîne û got, "TC li beramberî hêz, şiyan, berxwedan û têkoşîna xelkê Kurd û hemû Kurdistaniyan ketiye nav eczeke kûr û bi vê hêrs û kînê şer û êrîşkariya xwe her diçe zêde dike.


Êrîşên TC'ê tenê li bakur nînin, li rojava û li başûr jî berdewamin. Li van herdu parçeyan jî, êrîş dike û herêmê dagir dike. Ji serê vê salê ve li rojava Efrîn, li başûr herêma Sîdekan dagir kiriye. Li van herêman û li seranserê Kurdistanê, bi ruhê 15'ê Tebaxê, berxwedanek xurt û bê hempa tê meşandin."

KNK'ê da xuyakirin ku dewleta Tirk îro zîviriye rojên berê yên salên 80'î û dixwaze berxwedana xelkê Kurd, bizava rizgarî û azadiya Kurdistanê bifetisîne û wiha dewam kir: "Sîstema dad û dadgehê bûye toqa girêdan û esareta têkoşerên Kurdistanê. Dîsa ji berxwedêrên doza Kurdistanê zîndan tijî kirine. Şîdet û êşkenceya ji aliyê polîs û leşkeran ve bûye karekî rûtîn yê jiyanê li ser hemû xelkê Kurdistanê.

Lê belê ev liv û kiryar, ev hemî hewildan pûç û bê binî ne. Kurd, Kurdistanî bi ruh û giyanê 15'ê Tebaxê di nav berxwedan û têkoşîneke xurt de ne. Binketin a TC'ê ye. Serketin a gelê Kurdistanê ye."

## BI RUHÊ 15'Ê TEBAXÊ BIKIN YEK

Di dawiya daxuyaniyê de hate gotin, "Em hêvî dikin gelê Kurdistanê bi ruh û giyanê 15'ê Tebaxê, hemû hêz û şiyana xwe bike yek, tifaqa navxweyî kamilen pêk bîne û dijî her reng zulm û zora dagirkeran, têkoşîna azadî û rizgariya Kurdistanê bi ser bixe û bigihe armanca mezin."



## Sedema qrizê AKP ye

Tayîp TEMEL

AKP bi piştgiriya hêzên navneteweyî heye!

Rewşên awarte encamên awarte di afirînin. Darbeya 12'ê İlonê bi angaşta 'parastina pergala demokratîk' hatibû li darxistin. AKP bi salane, bi heman sedemê Tirkiyeyê di şert û mercên awarte û yên şer de îdare dike. Encamên derketine holê diyarin. Heya rê û rebazên asayî, siyasetek aştixwaz neyê pejirandin, qeyran, kaos û rewşa awarte bi dawî nabe.

Ji bo Tirkiyeyê di van şertan de bihêlin desthilatdar hertim neyarên navxweyî û yên beyanî di afirîn in. Bê neyar nikarin bijîn. Kurd, ji bo desthilatdaran hertim neyarê sereke yê navxweyî ne. Li gel kurdan tevgera sosyalist neyarekî jênegere. Her wiha dem dem pêwîsti bi neyarên cûda dibînin. Ji bo Kemalîstan; mutedeyîn, oldar li gel kurdan bi navê "ilticayê" neyarê navxweyî bûn. Dem û dewran guherî. Niha AKP li gor konjonktorê neyarên nû di afirîne. Kurd dîsa neyarê sereke ne. Carna Kemalîstan, carna Cemaat, carna derdorên cûda wekî neyar û dijber didin nîşan.

Herwiha wekî jiberkirinek mayîn de neyarên beyanî hertim ji aliyê iktidaran ve tên bikaranîn. Ev gotin û argûman di siyaseta Tirkiyeyê de ji bo desthilatdaran derfetekî zêrîn e. AKP jî ev 16 sale, welatên ku wekî neyarê Tirkiyeyê neda nişan nema. İsraîl, Almanya, Hollanda, Yunanistan, İran, İraq, Suriye, Amerika wekî neyar destnîşankirin. Bi neyariya van welatan AKP'ê girseya xwe hertim zêdetir organîzekir. Rê li pêşiya nerazibûnan girt. Di heman demê de bi vê argumanan partiyên qaşo muxalîf kire şirikê politikayên xwe. Çawa ku bi dijberiya kurd AKP'ê hertim piştgiriya CHP, MHP û partiyên din girt, bi gotina "nayarên Tirkiyeyên ên xerîb" van partiyan li dora xwe komkir. Di rewşên wiha de zimanên van partî û derdoran ji ziman û gotinên AKP'ê cûdatir nîne.

Lê bi rastî di qada navneteweyî û siyaseta realist de cihê dostî û neyariyê tûneye. Tenê berjewendî hene. AKP li gor berjewendiyên xwe hin caran dijberiya xwe ya van welatan derdixe pêş lê hertim bi piştgiriya van welatan hêza xwe didomîne. Têkiliya wî ya bi İsrailê re wisa ye. AKP çiqas dijberiya İsrailê dike ewqas jî têkiliyên xwe bi İsrailê re mezin dike. Li gor Erdogan İsrail "dewleta terorîst" e lê di meseleya Mavî Marmarayê de ji hemû argumûnanên xwe dev berda û dawiya dawî de malbatên kesên ku di Mavî Marmarayê de jiyana xwe dest dan suçdarkir. Di bûyera daxistina balefira Rusyayê de, Rusya wekî şirikê şerê Suriyeyê hate nişandayin niha dostê herî mezin yê AKP'ê Rusyaye. Esad ji aliye AKP'ê ve wekî Serokdewletekî kujer, terorîst dihat nişandayîn, operasyona Efrînê bi erêkirina Rusya, Suriye, İngiltereyê hat li darxistin. Pişt re bi Almanyayê re, bi Hollandayê re, bi İran û İraqê re heman qriz hatin afirandin û pişt re têkiliyên bi xurt û "dostane" bi van welatan re pekanîn.

Niha dora Amerikayê ye. Lê bi rastî Amerika hertim dost û şirikê Erdogan û AKP'ê ye. Dijberiya AKP'ê ya bi van welatan re dijberiyek suni ye. AKP bi piştgiriya van hêzan hate ser kar û hin jî bi piştgiriya van hêzan li ser kar dimîne. Bi van gotinan bi ser pirsgirikên esasî tên girtin, sedemên qrîzê tên veşartin. AKP xwe wekî mexdûr dide nîşan. Sedema vê qrizê Amerika nîne AKP ye.



# Gel û koçber li dijî çeteyan rabûn

***Kiryarên hovane yên leşker û çeteyên Tirk yên dagirker li Efrînê bê navber dewam dikin û roj bi roj zêdetir dibin. Welatiyên Xuta El Şerqiye ku Artêşa Tirk li Efrînê bi cih kirine li dijî çeteyan rabûn. Her wiha çeteyan hêjmarek ciwanên taxa Mehmûdiyê jî revandin û nayê zanîn bi kude birine.***

Li bajarê Efrînê di navbera welatiyên Xûta El-Şerqiyê ku artêşa Tirk li Efrînê bi cih kirine û komên çete yên girêdayî artêşa Tirk a dagirker de şer û pevçûn derketin. Li aliyekî din piştî ku hejmareke ciwanan ji taxa Mehmûdiyê ya bajarê Efrînê hatin revandin bi dehan welatiyên bajêr daketin kolanan û xwepêşandanek li dar xist.

Li gor nûçeya ANHA'yê artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê hejmareke ciwanan ku amadekariya xwepêşandanekê li dijî dagirkeriya Tirkiyê dikir, ji taxa Mehmûdiyê ya bajêr revandin û ber bi cihekî nediyar ve birin.



Revandina welatiyên Efrînê rojane dubare dibe û komên çete ji bo van welatiyan berdin xiracê ji malbat û xizmên wan dixwazin.

Li aliyekî din welatiyên Xuta El-Şerqiyê û bajaroka Dûma yên Şamê ku di lihevkirineke Rûsya û Tirkiyê de li Efrînê hatine bicihkirin û hewl didin demografyaya herêmê biguherînin. Di navbera koma çeteyan a Ehrar El-Şerqiye û koçberên Xûta de şer û pevçûn li Efrînê rû dan, lê sedema pevçûnan nehate zanîn. Gelek welatiyên Xûta ku xwest ji Efrînê derkevin û vegerin warên xwe, ji aliyê komên çete û artêşa Tirk a dagirker ve rastî destdirêjiyan hatin. Ji ber hovîtiya komên çete ku li ser parvekirina diziya malên welatiyên Efrînê şerê hev dikin, ewlehî bi temamî li Efrînê tune bûye.

# Polîtîkaya Erdogan dibe sedema krîzan



Parlamenterê HDP'ê yê berê Faysal Sariyildiz, bal kişand ser krîza aborî ya li Tirkiyê tê jiyîn û got: "Ev krîz bi şerê Erdogan ê li dijî gelê Kurd da destpêkirin re derket holê.

Parlamenterê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) a Şirnexê yê berê Faysal Sariyildiz, krîza siyasî û aborî ya li Tirkiyê tê jiyîn nirxand û wiha axivî: "Mijara Brunson, ev demek dirêje didome. Ji ber ku wisa naçe êdî krîz bi xwere anî. Erdogan demek dirêje, di nava pergalên cîhanê de, bi rêyên şantajê cuda hewl dide hebûna xwe berdewam bike. Heya demekê, ket nava lêgerînê ku têkiliyên xwe bi Rûsya û Çînê re baş bike. Gava ev kir jî, hewl da şantajê li DYA bike. Bi vî awayê DYA êdî bertek nîşanda. Êdî polîtîkayên Erdogan têk çûne û ev polîtîka dibin sedemên krîzan. Desthilatdarî ji bo têkçûyînê qebûl neke, hewl dide cihên cuda weke berpirsiyar nîşan bide. Weke ku tê îdîakirin, li dijî serxwebûna Tirkiyê tu êrîş tune ye. Kurt û kêmasî dixwazin fatureya krîzê bi welatên derve ve girê bidin."

Sariyildiz, anî ziman ku sedema bingehîn a krîza heyî neçareserkirina pirsgirêka gelê Kurde û wiha got: "Erdogan bi rêbaz û bersivên pir cuda, bersiv dan daxwazên demokratîk û meşrû yên gelên Tirkiyeyê û Kurdan. Ev yek bi vê eleqedere. Sedam krîzê ne tene îktîsadiye. Ev bi serê xwe manîpulasyone. Bi awayekê zanebûn ser sedemên krîzê digirin. Ji ber ku di navenda krîzê de Kurd hene. Erdogan û hêzên tarî yên dewletê di sala 2016'an de li dijî gelê Kurd, derdorên şoreşgerên Tirk, tevgerên demokratîk û Elewiyan şer îlan kirin. Erdogan li Kurdistanê sûcên pir mezin ên dij mirovahiyê kirin. Di dîroka Komarê de, yekem car bajarên Kurdistanê ji nexşerêyê hatin jêbirin. Bêguman vê darbeyek giran li maliyeta Tirkiyeyê da. Ne tenê maliyata maddî, di heman demê de, di warî manewî de jî darbeyek li maliyetê xistin. Ji ber ku Erdogan sûcê şer kiribû û gunehên mezin kirin."

## 'LI TIRKIYEYÊ SERMAYEYA HEYÎ NE DI EWLEKARIYÊ DEYE'

Sariyildiz, di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Dema em li krîza heya ya li Tirkiyeyê mêze dikin, bi tu awayî n sermayeya biyanî û ne jî sermayeya Tirkiyeyê di ewlekariyê deye. Krîz li ku derê hatibe destpêkirin divê mirov ji wir destpê bike. Ev krîz bi şerê Erdogan ê li dijî gelê Kurd da destpêkirin re derket holê. Ji ber vê yekê divê berê xwe bide wir."

# Divê statuya Êzidiyan were naskirin



NAV-YÊK'ê komkujiya 14'ê Tebaxa 2007'an a li Şengalê, li bajarokê Til Hizêr û Komelgeha Sîba Şêx Xidir bi bî anî. NAV-YÊK'ê komkujî şermezar kir û xwest ku statûya Êzîdiyan were naskirin.

Navenda Yekîtiya Komalên Êzîdiyan (NAV-YÊK) komkujiya 14'ê Tebaxa 2007'an a li Şenbalê, li bajarokê Til Hizêr û Komelgeha Sîba Şêx Xidir bi bî anî. NAV-YÊK'ê komkujî şermezar kir û ji Hikûmeta Herêmê ya Kurdistanê xwest ku statûya Êzîdiyan were naskirin.

Di daxuyaniyê de hate bi bîr xistin ku bi êrîşê, ya ku bi tankêrên bombekirî hate kirin, tevî jin, zarokan bi sedan Êzîdî hatine kuştin û zêdetirî 300 kesî birîndar bûye.

Her wiha hate gotin li gel ku 11 sal di ser komkujiyê re derbas bûne hê jî birînên Şengaliyan nekewiyane û perîşaniya malbatên qurbaniyan berdewam dike.

NAV-YÊK'ê di daxuyaniyê de wiha got:


"Baş tê zanîn komkujiya Şengalê ya 2007'an peyam û destpêka fermana mezin ya 03.08.2014'an bû. Piştî van kumkujî û fermanên mezin êdî civaka Êzdiya ne ya berêye û dost û dijminên xwe baş nasdike. Berî her tiştî eger hikumeta herêma Kurdistanê civaka Êzdiya Kurdên resen bibîne, pêwîste be cûdabûn û bi nêzikatiyeke pozîtîf ji bo statû, parastin û avakirina Şengalê rola xwe bileyize û civaka Êzîdiyan hêmêz bike. Di serîde divê ambargoyê ji ser Şengalê rake, baweriyê bide civaka Êzdiya û di pratîkê de gavên ber bi çav bêne avêtin.

## 'DIVÊ ÊZÎDÎ YÊKÎTIYA XWE AVA BIKIN'

Ji bo civaka Êzdiya mafê xwe bi dest bixe û li nirxê xwe xwedî derkeve pêwîst e yekitî û tifaqa civaka Êzdiya pêk were. Di vê pêvajoya dirokî de, ev erk dikeve ser milê rêxistin û saziyê civaka Êzdiya.

Em weke NAV-YÊK ji bo yekitî û tifaqa Êzdiya pêk were, tiştê ji me were xwestin em jê re amade ne.

Dîsa banga me ji bo gelê Kurd û bi taybetî ji civaka Kurdên Êzdî re, di vê pêvajoya girîng de li erkê xwe yên bingehîn xwedî derkevin."



## Xeyala nemir

Mihemed ŞAHÎN

Piştî peymana Lozanê, ji makezagona 1924'an şûnve hemû siyaset û polîtîkayên dewleta Tirk li ser tunekirina civaka Kurd hatin avakirin. 94 sale Kurdistan bi rewşa awarte û bi zagonên taybet tê birêvebirin.

Ji 1924'an hetanî 1946'an di serdema desthilatdariya zalimane ya yek partiyê de (CHP) bi hinceta serhildanan civaka Kurd ji qirkirinan hat derbaskirin. Cewherên civakê yên siayasî, aborî, civakî, manevî hemû hatin tunekirin. Ji bo ku ew cewher careke din zindî nebin tedbîrên gelek dijwar tên girtin.

Di qirkirina civaka Kurd de ewqasî bi serkeftina xwe bawerin ku li qontarê çiyayê Agirî ji xayalên Kurdistanê re tirbek çêdikin û li ser wiha dinivîsin "Xayalên Kurdistanê di vê tirba betonkirî de ne"

Li gorî wan êdî nepêkan bû kurdek Kurdistanê xeyal jî bike.

Piştî van salên dijwar pêvajoya "Kurd tune ne" dest pê dike. Edî li Tirkiyê berdêla Kurdbûnê gelek girane. Berdêl, mirina bê tirbe, mişextê bênavnîşane, talan û wêrana bênirx, bêpîvan û bêexlaqe, zîndana bêhiqûq û bêdalet e.

Li gel hemû zext û zordariyan, li gel berdêlên gelek giran dîsa jî Civaka Kurd dev ji xayala Kurdistana azad berneda. Di her fersendê de bi inyad li wê xayala xwe ya "tirbê de betonkirî" xwedî derket.

Her ku Kurd li xayala xwe ya pîroz xwedî derketin bi darbeyan re rû bi rû man. Darbeya 27'ê gulanê 1960, ya 12 edarê 1971, ya 12 îlonê 1980 û herî dawîn derbeya 15-20'tîrmehê 2016'yan hemû ji bo kuştina vê xeyalê pêk hatin. Tenê bi derbeyan bes nekirin, di heman demê de bi dehan komikên çete û hêzên tarî yên paramîlîter yên weke Ergenekon, Jîtem û çeteyên Sûsurlûkê ava kirin û wekî gurê har berê wan dan Kurdistanê.

Xeyala qedexikirî di salên 1960'de di tirba betonkirî de aj da. Di salên 1970'an de mezin bû. Derbeya 12 îlonê ya 1980'an ji bo carek din kuştin û binbetonkirina wê Xeyala Pîroz pêk hat. Lewre ji hemû derbayan dijwartir, qirker û xwînrêjker bû. Bi hezaran mirov hatin qetilkirin, bi sedhezaran mirov hatin hefskirin, bi sedhezaran mirov ji kar hatin derxistin, Zindan kirin navenda îşkancexane û teslîmgirtina îradeya Kurdê Xeyalparêz, binpêkirina hemû mafên mirovan rewa bû, Partiyên siyasî, Sendîqayên karker û karmendan, Komale û hwd. hemû saziyên sivîl hatin girtin. Li Kurdistanê nirx, pîvan, exlaq, hiqûq hemû bê wate bûn, li civaka Kurd jiyan kiribûn dojeh.

Derbakarên 12'ê îlonê li gel hemû hovîtiyên xwe yên pîvan nenas nekarîn wê xeyala ku aj daye, beton qelaştiyê û jê derketiye tune bikin. Şitla ku beton qelaştibû û jê derketibû nepêkan bû careke din vegere jiyana bin betonê. Veger jibinîve tunebûn bû. Lê berdêla mezinkirina şitlê jî gelek giranbû. Ji bo mezinbûna wê pêdivî bi xwîna pakrewan û şêrgeleyan hebû. Qet ne nexem bû. Ev de welatê Agir û Rojê bû, hêlîna pakrewan û şêrgelyan bû.

Di eşkencexanêyên zîndanan ku bibûn selexaneya mirov de hemû hewldanên derbekaran ên kuştina şitlê bê encam man. Nekarîn Şitla Xeyala pîroz ji destê Şêrgeleyên Kurd bigrin. Şêrgelayan li derûdorê Şitla Xeyala Pîroz ji îradeya xwe kelheyeke ji pola çêkirin, bi pêta agirê bedena xwe efsûnî kirin û 14 tîrmeha 1982'de ji pencereya zîndanê ber bi çiyayên welatê Agir û Rojê ve firandin.

Xeyala Pîroz a bi agirê laşê Şêrgeleyan efsûnkirî li ser çar hêlê welat geriya, ewrê reş û tariyê ku li ser welatê Rojê girêdabû belav kir û di 15'ê tebaxa 1984'de li ser çiyayê Çiravê û li ser çiyayên Şemzînanê danî.

Çiyayê Zagrosê ku navê wê bi xwe ji zayinê tê, çiyayê Cûdî ye ku geştiya Nûh Pêxember lê daniye û çavkaniya jiyana hemû candaran e, Çiyayê Sîpanê yê ku ji evîna Siyabend û Xecê re şahedî kiriyê, weke her caran careke din ji Xeyala Pîroz re helmêza xwe vekirin.

Şitla Xeyala Pîroz a ku 34 sal berê li Dihê û Şemzînanê bi destê çend Şêrgeleyan hatiye çandin kok û rehên wê li çar hêlê Kurdistanê belav bûne û di dilê çil milyon Kurdî de bi cih bûne. Ew şitil bûye daristan a ku ji darên 34 salî yên kevnare û qedîm ên ku rehên xwe gihandine neolîtîkê pêk tê. Derbekarê 12'ê îlonê nekarî çend Şêrgeleyan teslîm bigre û şitlê tune bike, lê derbekarê 15-20'ê tîemehê dibêje ezê 40 milyon Kurdî teslîm bigrim û daristanê tune bikim.